# DEMA NIHA

## AVA DNIEPRÊ

### ORDIYA SOR GIHAYE QERAXÊN DNIEPRÊ

LONDRE— Şevêçûyî Ordiya Sor di dirêjahiya 250 mîlan de gihaye Dnieprê. Danezana sovyetî dide zanîn ko leşkerên rûsî ji Dniepropetrovsk û hata Kievê di qeraxên Dnieprê de ne, û pêşmêrên rûsî ketine roavayê vê avê û li wê serpir danîne û şargeh çêkirin.

Ordiyên Rûsî di axa Ûrisên Gewir re derbaz dibin û niho ew ji sînorên Polonyayê 80 mîl dûr in.

BERLÎN— D. N. B. dide zanîn ko leşkerên sovyetî yên sihvanî di erdê Dniepra navîn de daketine erdê piştçeperên elemana bi wî awayî û bi derêxistina eskeran ser pîrê Kubanê, Ûrisa dikin xetên me yên qada şerê rohelatî bi timamî bişkînînin û perîşan bikin. Ûrisa ne bi tenê firqe têbelê qolordiyan têxin qada şerî. Qiwetên rûsî ji aliyê din Borovaya zeft kiriye, 30 kilomêtir di hindurê axa Ûrisa Gewir de.

MOSKÛ— Nûçegihayê rojnama rûsî Pravda dide zanîn ko di şerê Smolenskê de, refa frensizî Normandî di teniştа hevalên xwe Ûris de mêranî kiriye.

STANBOL— Ji Bukreşê didin zanîn ko qiwetên rûsî di axa Kubanê de dora firqeke rûmanî girtiye.

QAHIRE— Refên brîtanî balafirgehên giravên Rodos û Giridê ji nû ve bombardîman kirine.

## MÊRANIYA FRENSIZA

### Rojnameyên Rûsî Pesnê Wan Didin

MOSKÛ— Rojnama rûsî Krasnî Filot li ser şerevaniyên frensizî û egîdiya wan dinivîse; leşkerên frensizî di şerê serbestkirina erdê Frensê de, bi xwîna xwe dastanine zêrîn nivîsandine û xistine nav rûpelên dîroka Frensê. Di şerê Sehrayê de heştirsiwarên Gêneral Leklerkî karine mezin pêk anîne. Lekên frensizî di bin fermandariya Gêneral Jiro de, li Tûnisê ji bona şkênandina Ordiya elemanî Von Arnimî bi mêranî şer kirine; perîşankirina vê Ordiyê de para frensiza heye. Deryavanên frensiz ên egîd, di Tulonê de, bi çavsoriya xwe serfiraz bûne, waporşerên xwe xeriqandine, ew ne dane destê dijmina.

Ev tiştên he rûyê şerê Behra Spî guhartiye, ji ber ko Hitler nikarî bû di Behra Spî de tasa şihinê ber bi xwe ve giran bike.

LONDRE— Ko careki qiwetên Hevalbendan pê li erdê Ewripayê kirin 200.000 welatparêzên frensiz rabin û di Frenseyê de, berberiya elemana bikin. Ji xwe tiştê ko welatparêzên frensiz di Korsê de kirine, delîlî vî tiştî ye.

## DÛRIK

### DÛRIKÊN LI BER TEMBÛRÊ

#### CANA MIN

Rêka Midyatê bi qaş e
Cana min
Derpiyê Helim qimaş e
Cana min
Ereq vexwar serxweş e
Cana min.
Dikim herim Helebê
Cana min
Qeysa bejna xwe bigre
Cana min
Te d' bînim de na bînim
Cana min
Te d' gerdenê wertînim
Ezîza min,
Xelk evdala malê dinê
Cana min
Ez aşiqê çavê şîn im
Ezîza min.
Dikim herim Mêrdînê
Cana min
Qeysa lingê xwe bigre
Cana min
Ji te r' bînim potînê
Cana min.
Xelk evdala malê dinê
Ezîza min
Ez aşiqê çavê şîn im
Cana min.

#### ZEKIYA

Eman, eman Zekiya
Ez xulam bisk û guliya
Bihna misk û enberê
Ji memika fûriya,
Te dî bû l'ser xaniya
M' dî bû l'ser xaniya
Tena, tena dimeşiya
Mi dest avêtê xebxebê
Bû xuşîna mûriya,
Ez ketim dilim êşiya
Bi ser mi de ditewiya
Wek kevanê li Bûçiya,
M' devê xwe xist gerdenê
B' ser devê min de beliya.
Ramûsan pir şîrîn in
Wek şekirê elbika
Mînayê qeymaxê miya
Tim l' serê biharê
L'ber beg û mîrzaya;
Eman, ne man Zekiya.
Mi Zeko dî l'ber dî wêrê
Mi dî şewqa kirikê
Dayê cotê guhêrê
Mînayê serik penêrê
J'mehbetê ez ne bûm têrê
J' kê tirsê û j'kê ne wêrê
Tirsa wê j' kuç'kê mêrê.
Eman, eman Zekiya
Ez xulam bisk û guliya
Bihna misk û mehwerdê
Ji memika fûriya.
Mi Zeko dî l'ber neqebê
Çêkir fitla qesebê
Kulê Zeko giran bû
Da ser derdê kezebê,
Eman, ne man Zekiya
Ez xulam bisk û guliya.
Zeko zînê Seyranê
Kewoka qehwexanê
Li wî siwarê, li meydanê
Kêroşka tajî berdanê
Ne kuştin û ne gihanê
Rû sohir ji ramûsanê
Xwedê mirada bike
Li ser dîn û îmanê.

#### GULÊ

Gulê, gulê, lê gulê, lê gulê.
Gulê tu metka Ferec e
Bi xeftanê melemenc e
Tu ji alî malê ne çenc e
Gava şer bûn li nevalê
Sê siwar derketin bixarê
Yek xelîlê xezalê
Yek lawo Ferxo kinê
Û yek Hiseynê Delalê.
Gulê ebûqatê
Bê l'anet bavê hatê
Te xwar dîkê sibatê

## PÊJINÊN DINYAYÊ

### CENG & BIHINGEH



Mirin Emrê Xwedê ye, Lê Xwedê Derd Daye û Derman Daye; Piraniya Me Ji Nezaniyê Dimirin. Miletên Zana Bi Vî Awayî Guhdariya Nesaxan Dikin.



Ji Bergehên Qefqasyayê Tiflîs, Payetextê Gurcistanê



Bihayê Sêvekî Bi Isûl û Zanîn Dibe Du Qat

IMPRIMERIE DU JOURNAL LE MIROIR D'ORIENT

